

POPKURD



PoPirs | Osman MEHMED



Fûar e Ha Fûar e! | Roza SÍERRA



Selamî ESEN | Té Gotin...



FENOMENEKÎ JI MALÊ,
LÎSTIKVANEKÎ ZÎREK

DENO

“DIYA MIN
HERTIM
DIGOT,
ZÊDE
LEQLEQÊ
NEKE,
RABE
Û
BIKÊ”


Silav ji we re xwînerên me yên ezîz.
Me gelekî bêriya we kir û va ye em bi hejmara xwe ya sêyem
li ber we ne. Em dizanin we jî bêriya me kiriye.
Kerem bikin va ye hejmara nû.

POPKURD
2018 Mijdar • Jimar 3

Berpirs û Edîtor
Mistefa Dogan
Omer Bextiyar

Rûpelsazi
Ridwan Xelil

Em berpirsê
hemû nivîsên we ne!



NAVEROK



RIHLETGUZÎN: XEWNA
EVÎNDARÊN ŞOREŞÊ: **KUBA**
Mihemed BÎLEN
Rûpel 04



**ÇEND GALEGAL
LI SER ROJEVA KURDAN**
POP KURD
Rûpel 11



DENGBÊJ
Salihê Qubîni
Rûpel 12



KA JI ME RE BÊJE
Evdila **KESKÎN**
Rûpel 13



POPIRS
Osman **MEHMED**
Rûpel 15



PASAJ
Mihemed **ŞARMAN**
Rûpel 17



FÛAR E HA FÛAR E!
Roza SÎERRA
Rûpel 18



HEVPEYVÎN: DENO
Bilal KORKUT
Rûpel 23



XÊZ
Bêrivan SARUHAN
Rûpel 26



POP NÛÇE
Omer BEXTIYAR
Rûpel 27



GELEKÎ NAVDAR
Musayê DIKANDAR
Rûpel 29



ME JI 10 KESAN PIRSÎ
PopKURD
Rûpel 31



GELO WE DIZANIBÛ?
Selamî ESEN
Rûpel 35



MEKAN: ESKICI CAFE
Yahya OMERÎ
Rûpel 37



**HEVPEYVÎN:
ORHAN TANHAN**
Kenan Ormek
Rûpel 41

KUBA



RIHLETGUZÎN
Mihemed BÎLEN

Li her qadên bajêr çî
biçûk çî mezin mirov pêrgî
peykerên cûrbecûr tê. Bi
pirranî jî peykerên José
Martí û Don Kîşotî çêkirine.

Kuba; Xewna Evîndarên Şoreşê:

Heke mijara nivîsa we welatek be ku bi Komunizmê tê birêvebirin û li cihanê welatên wisa pir kêmbin û bi ser de jî ev welatê hûn ê behsê bikin sembola sîstema Komunîst a reel bi xwe be, divê hûn hay ji her peyveke xwe hebin.

Heta wê rojê gelek kesan derheqê wî welatî de tiştên cûrbecûr û cihêreng gotibin û nivîsandibin, bi ser de çavdêriya yekî jî ne wekî yê dî be, ev yek karê mirov dê zehmettir bike. Her çi qas zahmet be jî di rewşên wiha de em bi tişteki piştrast in; şîrovekirina sosyolojiya civakê jî rêça hemwelatîbûyîna ango bi borandina wextekî têr-dirêj a li wî welatî pêkan e.

Ji bo gerokekî rêwîtiya ber bi her welatekî nû ve kelecaneke teze ye. Lê hindek ji wan welatan dikarin wê kelecane çend çatan berztir bikin. Kuba jî yek ji wan e. Gava sê heval me li hev kir ku em biçin welatên Caribbean (Karîbîk), ewilî me jî Komaleya Dostaniyê ya Kubayê daxwaza vîzeyê kir û di demeke kurt de vîzeyên me bi buhayê 150 lîrayê Tirkî gîhaştin ber destê me. Lê ev vîze ne wekî yên welatên din klasîk bûn. Ya ku di dewsa vîzeyê de dabûn destên me di dirûvê bilêtekê de bû. Wexta me jî berpîrsê acenteyê pîrsî ka çima ne wekî vîzeyên alemê ne. Bersiva wî balkêş bû. “Emerîka ew kesên mohra vîzeyê Kubayê li ser pasaporta wan heye asteng dike

û vîzeyê Emerîkî nade wan, lewma dewleta Kubayê, ji bo tûristên ziyareta Kubayê dikin mexdûr nebin, rêyeke bi vî rengî peyda kiriye.” Jixwe di ketin û derketina welêt de jî karmendê pasaportê ji we dipirse, tu dixwazî mohra Kubayê li ser pasaporta te hebe an na. Wekî hûn ê jî texmîn bikin me bi neyînî bersiv da. Bi heddê kê ketiye Emerîkayê ji xwe bixeyidîne, ma ne? :) Ya rastîn ji ber ku piştî Kubayê, Emerîka jî di nav de em ê hê biçûyana gelek welatên din, divê em bi tevdir tevbigeriyan. Em ê ji Hawanayê biçûna Domînik Repûblîk (ji ber ku hûn nikarin ji Hawanayê rasterast biçin Emerîka û koloniyên Emerîkî) ji wir jî em dê biçûyana Nassaûya paytextê Bahamayê, ji wê derê jî ber bi Florîdaya Emerîkayê. Pişt re jî em dê biçûna Porto Rikoyê ku dê rawestgeha me ya dawîn bûya. Axir, her welatek mijara nivîsekê ye. Em vegehin geşta xwe ya Kubayê.

Di payizeke dereng de balafira me ji ser Madrîdê dê xwe bigihanda Hawanayê. Di wexteke ku Stenbol pêjna zivistanê dike, me berê xwe dabû parzemîneke têrtav. Berêvarekê piştî rêwîtiyeke bi qasî şanzdeh saetan, ku kes nizane bi çend şûşe şerab me xwe tevzandibû û xwe avêtibû Hawanayê. Ji bo şeva ewil li otêleke li perava bahrê me cih veqetandibû. Ronahiyên bajêr ên nîvtarî nedihîştin em derûdora xwe têr bibînin. Di wê şereşê de hin jinên reşik ên ku piştî xwe sipartibûn dîwêr û hin xortên ku xwe li dora



wan li ba dikirin bala me kişandibûn. Diyar bû li Hawanayê jî şev wekî welatên Efrîkî bi mizawirî diteqilîn. Bi gihastina otêlê, em bi tiştêkî din hesiyan. Dengê ecêb gurr em pêşwaz kirin, gumîniya ji dîwarê ber peravê tê, wekî dengê ewrên biharî bûn. Wî dengê pêlên zeryayê ku xwe li peravan diqeliband nehişt wê şevê kes rakeve. Û vê yekê jî kir ku dotira rojê em ji xwe re cihekî nû peyde bikin.

La Casa de Daisy:

Li Kubayê gelek kes odeyên malên xwe bi kirê didin tûristan. Li hember vê xizmetê jî %70yî wekî bac didin dewletê. Ji bo em di nav xelkê bajêr de zêdetir wext derbas bikin û hev baştir nas bikin, em li casayekê (bi Spanyolî Mal-Xanî) du odeyan kirê dikin. Xwediyê vê casayê jineke ji Hawanayê ye û navê wê Daisy e. Bavê wê di şoreşa Kubayê de general bûye. Daisy di salên xwendekariya zankoyê de dil berdide xortekî Emerîkî ku navê wî Paul e. Piştî çend heyvan Daisy dixwaze dev ji mekteba xwe berde û bi Paul re bizewice û biçe Emerîkayê. Her çi qas malbata wê li hember vê têkiliyê be jî Daisy bi ya xwe dike û bi kurikî re diçe Orlandoyê. Piştî çend salan bi hev re wekî jin û mêr dijîn, keçikeye wan çêdibe, hê keçika wan

şev mehî ye Paul dil dikeve jineke din û dev ji Daisy berdide. Li gorî Daisy behs dike ew li ser Paul dimire, ji bo wê Orlando Paul e. Heger Paul ne di heyata wê de be tu mane û bedewiya Emerîkayê nîne û vedigere.

Piştî keça wê Rosa hinek mezin dibe ji mala bavê xwe vediqete û dikeve vî xaniyê ku aniha tê de ye. Bi alîkariya dewletê çend odeyên xwe dide bi kirê û wisa debara xwe dike. Jineke henûn e Daisy, ji mêvanên xwe re pir baş e...

Carekê dema pîrsa Fidel Castro jê dikim ka welatî jê hez dikin an na. Bersiveke ne li bendê me dide min: 'Fidel zalimekî zimanşîrîn e. Her ku li qada şoreşê ya Hawanayê mitîngek çêdibe û Fîdel derdikeve ser dikê û diaxive. Hemû kes ji çol û beyarên derûdorê radihêjin ber û kevirên girs û xwe didin benda wî. Piştî demekê Fîdel derdikeve ser dikê û dest bi axaftina xwe dike. Fîdel bi zimanekî wisa zelal, wisa ji dil û mişt bi hezkirina welêt dagirtî dipeyive ku, hûn ê bêjin ezîzek li hember min e, pêşî rûyê beşdaran, paşê jî destê wan sist dibin û bi şermekê wî kevirî ji dest xwe diavêjin erdê û ji wî re li çepikan dixin. Piştî mitîngê li ser riya vegeerê hemû kes stranên Fîdel ên şoreşgeriyê dibêjin. Fîdel ajîtorê herî baş ê cihanê ye bi raya min.



Ji deh rojan zêdetir em li casaya Daisyê dimînin. Pêdiviya me her ji çi çêdibe wê kêliyê ji bo me peyde dike. Em wisa dibihisin ku yên çûbin Kubayê heke bê rom û bê puro vegerin, têra wan li wan dixin. Ji bo ev sosret bi serê me de neyê Daisy çend qutî Puroya baş a Cohiba û Romeo û Julietê ji bo me bi bûhayê herî kême peyde dike. Li fabrîqe û li tobacco shopên bajêr qutiyek Cohiba, teqriben bi 380 dolarî ye. Daisy ji wan karkerên di fabrîqeyê de kar dikin, bi buhayê yekê deh qutî puroyên Cohibayê ji bo me standibû. Di vê navberê de, haya we ji puroyên sexte hebe. Di puroyê de ya girîng ew e ku divê puro bi bandrol û hêwî bin ango ne zuwa û hişkolekî bin. Û tişteki din, ew efsaneya ku keçikên ciwan ê Kubayê van puroyan li ser paqên xwe dipêçin zirr derew e.

Dayika Daisyê Oneyda jineke heştê salî û bi nexweşiya Alzheimerê bû. Carinan serê sibehan wexta şiyar dibû, carinan jî êvaran bi dengê bilind gazî xwe dikir, ONEY-DAAA, ONEYDAAA! Em miraq dikin ka çima wiha dike. Li gorî ku Daisy dibêje, ji ber ji navê xwe hez dike û haya wê ji nexweşiya wê heye wekî xwe testkirinekê û bi taybetî ji bo navê xwe bi xwe nede jibîrkirin rojê du caran bi dengê bilind navê xwe bang dike, bi xwe bi bîr tîne.

Kolanên bajêr û çend tiştên din:

Ji roja ewil heta roja dawî em ji bîst kîlometreyan kêmtir nameşin. Hawana wekî Diyarbekir bajarekî dûz e, lewma mirov ji meşê têr nabe. Avahiyên bajêr bi mîmariya Spanyolî hatine lêkirin, problema avahiyên bes ew e ku bi demê re kevîna bûne û nehatine nûkirin ango renovekirin.

Li kolanên fireh ên Hawanayê mirov xwe azad hîs dike. Ne dizî, ne şer, ne kaos... hûn ji van rastî yekê jî nayên.

Li her qadên bajêr çi biçûk çi mezin mirov pêrgî peykerên cûrbecûr tê. Bi pirranî ji peykerên José Martí û Don Kîşotî çêkirine.

Di dema tûra nav bajêr de em li ku bi-westin kokteyleke cuda dicibînin, Mojito, Kuba Libre, Pina Collada. Li barê kokteylek bi buhayê 2 dolaran tîna firotin. Ji aliyê naverokê ve ferqa xwarinên Kubayê ji xwarinên latînî nîn e. Li her malê kême zêde heman zad û zewade hene. Piştî şoreşê ji ber ku hilberînên xwemalî, ji aliyê dewletê ve hatine belavkirin, metbexa Kubayê zêde pêş neketiye. Birinc û şorbeya fasûliyên reş, xwarinên herî navdar ên gelêrî ne. Wekî din xwarinên heywanên avê û xwarinên bi fêkiyên tropîk tîna çêkirin. Berî em ji Kubayê veqetin bi du rojan me biryar da ku noqî



avê bibin ango biçin divingê. Firavîn di nav de, me bi şerîkeyeke divingê li hev kir ku me bibe aveke masiyên rengîn û mircan lê hene. Şeşê sibehê bi erebeyê di du saetan de me xwe gihand cihê ku em ê noq bibin. Tevî tûpê bîstkiroyî cilê nokvanan me li xwe kirin û digel pisporekî divingê em noqî zeryayê bûn. Li vê derê divê bêhnekê bidim û kevanekê vekim. Yek ji xweştirîn ceribandînan min en heyatê bû ev. Di wê saeta rojê de aveke wekî giyanekî zelal, masî û mircanên rengorengo, mirov bi hebûna xwe dida hisandin. Her ku mirov berjêr diçû bêhtir hez dikir ku berjêrtir dakeve...

Vegerê li ser rê ji bo firavîne em li tesîsekê radiwestin. Berî em li xwarinê rûnên rêberê me dixwaze me li nav daristanê bigerîne. Em li çewligekê disekin. Çewliga tîmsehan e ev der, bi deh hezaran tîmsehan li pêşberî me ne. Wekî çêlikên hemû heywanan çêlikên tîmsehan jî şîrîn in. Tîmsehan li vê derê wekî goşt û wekî çerm tîm firotin. Di firavîne de surprîzek li benda me ye, sê celeb goşt li ser masê ne, kêr zêde rengên wan dişibihin hev. Bêyî em bipirsin aşvan dibêje; “ev goştê qazê ye, ev yê xezalê û ev jî yê tîmsehanê ye, hûn kîjanê dibijêrin hûn bi kêfa xwe ne.” Helbet ez ê li vir nebêjim kê ji kîjan goştî xwariye. :)

Derbarê civak û dîroka Kubayê de:

Kuba, bi navê xwe yê fermî Komara Kubayê, welatê di nava komgiravên Karabîk de yê herî mezin e. Miletên Kubayî bi gelemperî Spainî ne. Yên mayî jî Afro-Kubayî, Çînî, Emerîkî û Ewropî ne. Tekane welat e ku mirov ji ber rengên xwe nayên darizandin û bi çavê nijadperestan li wan nayê nêrîn. Li gorî rapirsîneke UNESCO'yê li cihanê welatê herî zêde ji aliyê mirovan tê tercîhkirin ev der e. Ango welatê herî zêde mirov dixwazin bibînin. Du celeb pereyên fermî yê Kubayê hene. Yêk jê Peso ye ku miletê nişteçî bi kar tîne û sûretê lehengên şoreşa Kubayê li ser e. Bi navê CUC jî pereyê ku bes ji bo turîstan hatiye çapkirin jî heye. Di nav van herdu pereyan de wekî nirx ferqeke pir mezin heye. Ji bo kesên dixwazin wekî tûrist bînin vê derê em ji niha ve bêjin; ev der ne cihekî erzan e, bes ji welatiyan re cenneta baqî ye.. Ji ber ambargoya heyî ya Emerîkayê, kartên bankeyên Emerîkî qedexe ne. Dolarên ku hûn dê bixwazin xurde bikin jî bi nirxekî pir kêr ji we tînin kirin, di dewsa Dolar de hûn Euro bi xwe re bibin hûn ê kêmtir bixisîrin. Li her kolanê seyarêyên klasîk ên Emerîkî yê beriya şoreşê hene. Heger hûn bixwazin erebeyê wisa kirê bikin divê hûn tevî şifêr kirê bikin, an na dê nedin we. Kuba binemalake gewre ye



di dansên cîhanî de. Salsa, Rumba, Bolero û Cha Cha ji vê derê pengizîne cîhanê. Mirov dikare bêje mîletê Kubayê bê du tiştan nikare bijîn; Dans û mûzîk. Jin û mêrên ku li kuçeyê li gel mûzîkên Buena Vista Social Club dans dikin ne kê m in.

Ernest Hemîngway romana xwe ya 'For Whom The Bell Tolls' (Naqoz ji bo kê lêdîdî) li vir nivîsandiye. Di nivîsa min a berî vê jî li Tanzania û Klîmanjaroyê rêya me û ya Hemîngwayî gîhaştibû hev. Yê nizanibe dê bêje bi pey şopa Hemîngwayî ketine. :)

Li Hawanayê mala Hemîngwayî ji aliyê hevalê wî yê qedîm Fîdel Castro ve hatiye parastin. Her êvar li bara bi navê Florîdîtayê bêyî ku Margarîtayekê vexwe naçe mal Hemîngway. Li Florîdîtayê quncikeke wî ya taybet heye ku piştî mirina wî peykerê wî lê danîne.

Ji şoreşgerên şoreşa Kubayê yê herî zêde tê hezkirin jî Camillo Cienfuegos e. Helbet jî Che Guevara û jî Fîdel û Raul jî hez dikin, lê ne bi qasî Camillo. Wexta em sedema vê yekê jî Kubayîyan dipirsin gelek bersivên



cihêreng didin. Hin ji wan dibêjin wexta mir 27 salî bû, pir xort bû. Hindek jî dibêjin wekî plansazekî şoreşê, di eniyê de şervanekî ne kêmi Che Guevara bû.

Sala bê Şoreşa Kubayê dê bikeve 60 saliya xwe, ev şêst sal e Kuba bi Komunizmê tê birêvebirin. Ji bo gravdewleteke ku di hewşa welatekî goştخور de, hebûna xwe didomîne, emrekî têra xwe dirêj kiriye. Miletê Kubayê kirêdayin çî ye nizane. Ji ber ku ji %90ê miletê Kubayê di malên xwe de dijîn. Yên mayî jî di malên dewletê de bê beramber rûdinin. Piştî têkçûyina sistema Komunîst a Sowyetê, Kuba bi xêra tûrîzmê li ser piyan maye. Helbet tûrîstîkbûyin her çiqas ji bo aboriya welat baş bûbe jî, ev yek li bajarên wekî Hawanayê nehatiye û her çûye miletê nişteciyê Hawanayê, ji Komunîzmê dûr xistiye. Li Miletê bifikirin ku heta niha telefonên destan jî bi kar neanîne û haya wan zêde ji markayên cihanî yên populer nîn e, ji zewac an jî ji karekî taybet pê ve ji welêt derneketine der. Yanî hema hema xwediyê xwe û her tiştî ne ji bo xwe bextewar bibin. Lê ev rewş bi tûrîstên tîn û diçin roj bi roj guheriye. Bi taybetî piştî ku çav li hilberînên kapîtalîst ên teknolojîk dikevin, dilê xwe dibijînin wan..

Pêdiviyên miletê Kubayê yên bingehîn ên wekî perwerdehî, tenduristî, niştecibûn, xwarin û vexwarinê, bi destê dewletê tê

çareserkirin. Digel van hemû piştgiriyan ji ber ku her zarok ên dewletê tîn hesibandin, ji malbatên xwedî zarok re alîkariyên ekstra tîn kirin. Bo nimûne; li mala ku em lê diman, dewletê piyanoyek ji bo keçîka malê ya 6 salî şandibû. Gava em ji ber dibistaneke seretayî derbas dibin paqîjiya bedlên zarokan yekser bala me dikşîne. Li Kubayê rêjeya xwendin û nivîsandinê li gorî îstatîstîkan li dor %99.8an e. Tu kes ji ber karê ku dike, ji xwe kêmtir nayê dîtîn. Kuçeyên bajêr ew çend ewle ne ku piraniya welatîyên Kubayê deriyên xwe naqûflînin. Şer û pevçûn nîn e, taybetî şideta hêzên ewlekariyê qet nayê dîtîn. Şênîyên bajêr ji hêzên ewlekariyê natirsin.

Di destên zarokan de telefon û tablet nîn in. Li kuçeyan dilîzin . Belê hinekî qemer û zeifokî ne lê ev nayê wateya ku tenduristiya wan ne baş e. Wekî min bîsteke berê jî behs kiribû bi riya tûrîzmê kapîtalîzm tesîreke mezin li çîrnê nû kiriye. Ji ber îtirazên nîfşê nû, dilê hikûmetê heye li otêl û qadên bajêr întereteke sînordar serbest dihêle. Sînorê sînordariyê jî teng kirine, ji ber ku gava hûn bixwazin li mailên xwe binihêrin divê hûn nîvsaetekê li bendê bin :)

Digel hemû kêmaniyên xwe, Kuba welatekî wisa ye ku mirov ji behskirina wê, ji hezkirina wê û ji gera wê tîn nabe. Bi hêviya Kurdîstaneke serbixwe ku bi qasî Kubayeke azad...





**ÇEND GALEGAL
LI SER ROJEVA KURDAN**
POPKURD
popkurdkovar@gmail.com



CEGERXWÎN: KAWA! DEV JI MIN BIQERE!

Ev pêlek e li ser înternetê şerekî giran heye. Aliyekî îdia dike ku “Cegerxwîn ne ti Şa’ir e û hin Kurd wî zêde mezin dikin.” Pêşengê vî aliyê Şa’ir û wergêr Kawa Nemir e. Kawa dibêje: “Şi’êra Cegerxwîn ŞORIŞEKE ŞAŞENCAM(?) e.”

Helbet aliye din jî li hember vê rexneyê gelek hêrs bû û got “Ev rexneya li helbesta Cegerxwîn tê kirin “bêwijdanî” ye û lazim e kesên rexneyan dikin li gorî dema ku şa’ir jiyaye pipeyvin. Ji vê hêlê rexneya herî tûj Lokman Polat li Kawa Nemir kir û got “Kawa hişê xwe xwariye!”



GELO ŞERÊ SAÎD GABARÎ Û ÎMAD SELÎM ÇI BÛ?

Demeke berê Saîd Gabarî di vîdyoyên xwe yê Youtubeyê de gelek diavêt Îmad Selîm. Geh digot “hinek wekî papaxanan, stranên me jî ber dikin û dibêjin” geh digot “Îmad nehiştiye ez di daweta filankeso de lêxim.”

Gazina Gabarî her ew e ku Selîm stranên wî dibêje û tarza wî teqlîd dike. Li gorî Saîd Gabarî dibêje “Îmad Selîm jî bo 300-400 awro zêde şabaşê bigre gelek caran nehiştiye ew di dawetan de kilaman bêje. Îmad ne hêja ye ku ez behsa wî jî bikim.”

Ji terefê Îmad Selîm derbarê vê meselê de hêj daxuyanî nehate û her kes bi meraq li bendê ye ka wê Selîm çawa bersivê bide van gotinên Gabarî.



“ÇIMA QEY EM ÊN DÊMARIYÊ NE??”

Weşanxaneya Avestayê, çendeyeke berê Antolojiya Çîrokên Kurdî çap kir. Nivîskarên Kurd ên ku çîrokên wan tê de hebûn, şûr simbêlê wan nedibirrî. Misêwa behsa antolojiyê dikirin û li ser înternetê belav dikirin.

Lê helbet koma dilşikestî jî hebû. Wan jî gazin dikirin ku naveroka antolojiyê gelekî qels e û birrek çîroknûs tê de tune ne. Li ser ku çîrokên wî di antolojiyê de tune ne, H.K. Baqî jî ser hesabê xwe yê fermî daxuyaniyek da û me’alen got: “Qet ne xema min e û kêfa min jî antolojiyan re nayê. Şuxlê zarokan e û wek prensîb ez tevli antolojiyan nabim.” Lêêê... Gurê arşîvan Înan Eroğlu kitêba antolojiyê ya bi navê “Biraz Dolaşacağım” nişan dayê û got: “Ê seyda va ye navê te di vê antolojiyê de heye.”

Pişt re em jî nizanin çî bû yeqîn.



TÊ BÎRA MIN

Dengbêj Salihê Qubînî

Sala 1974an bû. Ez li Diyarbekirê, ji xwe re li sûkê dimeşiyam. Zilamekî ku ez wî nas nakim, ket mile min û ez birim qehweya Mihemedê Hezroyî ya li Çarşiya Şewitî. Li qata duduyan, dengbêj li hev civiyabûn. Ha min dît, ez di nav wan de me. Min dû re fêm kir ku dengbêj hertim li wir dicivayan.

Evdilhadiyê Dengbêj hebû li wir. Dengbêjekî gelek bi nav û deng bû û li Kurdistanê her kesî bi şana wî dizanibû. Ew mihacirê Serhedê bû. Dengbêjê mala Cemîlpaşayan bû. Min Evdilhadî cara ewil dît.

Li wê civatê dengbêjan, li min de'wa kilamekê kirin. Axir min strana "Şêxo û Meyro" ji wan re got. Di orta kilamê de Mihemedê Qoroxçî stran ji min stend. Piştî stran qedand, Evdilhadiyê Dengbêj awirek da Mihemedê Qoroxçî û wiha got:

"Mihemedo lawo, qey tu bi parsê ketî?

Qey şîva şevê ji te re nemaye?

Ê ku ji Meyrê 25 Meyrêyan dernexe,

Çarika jina wî li sere wî be."

8 sal piştî vê, di sala 1982yan de, ez bi trêne ji Diyarbekirê diçûm Batmanê. Min dî wa ye Mihemedê Qoroxçî li odeyeke trêne rûniştiye. Li dora wî çend zilam rûniştine. Civata wî, lê de'wa kilamekê dikir. Wî jî xatirê wan nehişt û dest bi kilama "Hesoyê Brahîm" kir. Piştî ku dest pê kir min kilam jê girt. Min dî awirê wî tirs bûn û li min meyzand. Piştî kilam xilas bû go "te çima kilam ji min girt?" Min jî bi ken lê vegerand: "te jî waxtekî ji min girtibû, em fit bûn."



Gava behsa EVDILA KESKÎN dibe, çi tê bîra te?

İSMAİL BEŞİKÇİ

Kurd û Tirk gelekî deyndarê wî ne. Nexasim wî rê li ber rewşenbîriya Kurdî vekir. Loma jî berdewamiya karên Avestayê gelek muhîm e.

BERKEN BEREH

Dema navê Evdila Keskin dibihîsim yekser; mirovekî çeleng î zîrek, zana, bîrbir, xwedî ehd û cehdeke xurt û dilsoz ê kurd, kurdî, kurdolojî û edebîyatê tê bîra min. Maqûlî, xweşsihbet û qedirdayîna bo kes/en li civatê hêjayî pesindanê ye lew, ev rengê ji camêrî û nefspiçûkîya kurdî ye. Bi van xisletan ew, rabûn û rûniştin, keşûhewaya şêwr û şevbêrkên bi peyv û toreya kurdî xemilî zindî dike. Evdila Keskin yek ji wan kesan e ku hewl da û hewl dide. Nirx û rûmeta çand û kultura kurdî berz û bilind bike. Ew entelektuel, rîspî û aqilmendekî hêja yê roja îro ye. Mirov di gel wî ji xwe, ji kurdbûna xwe, xwe serbilind û bextewar hîs dike.

HATİCE KAMER

Ewilî ez vê bibêjim ku ez li bendê me ka wê kengî tecrubeyên xwe yên weşangeriyê binivîse. Wî gelek ked da. Berhemeke pir giranbûha ava kir ku ew wekî kelehekê li piştî ziman, edebiyat û kultura Kurdî ye. Navê wê berhemê jî Avesta ye.

KAWA NEMIR

Kar û barê ku wî kirine jixwe diyar in. Hewce nake bêjim. Tevahiya milletê Kurd divê qedrê wî baş bigre. Ez dixwazim weşandina wergera Ulyessê bibe nesîbê Weşanxaneya Avestayê. Ev li ba min daxwazeke xurt e. Ka em binêrin...

NURCAN AKTAY

Wî di salên herî zor de barê Kurdî hilgirtiyê û loma jî qedrê wî li ba me gelek e. Heke 3 kesên wekî wî hebûya niha rewşa me pir baştir bû.

XEZAL XEMRÎ

Sibhanella! Tam pirseke li gorî POP-KURD'ê ye!

Evdillah Keskîn...

Dema ez li wênayên wî û malbata wî dinihêrim malbatên mîna Bedirxanî û Cemîlpaşazadayan tîn bîra min. Ew malbat jî mîna van malbatan malbateke esîlzade ye. Ji ber vê heger Kurdistanek çêbûya min dix-

west Keskîn serok an wezîrê çand û hunera kurdî ya giştî bûya!

NAZÊ MAHABAD

Ez dibêm qey dema behsa wî camêrî tê kirin ewilî “karîzma” tê bîra min.

CESÎM ÎLHAN

Dema ku dibêjin Abdullah Keskin weşangeriya kurdî tê bîra min. Ew rûyê weşangeriya Kurdî spî dike.

NARÎN YÜKLER

Ji bo mirov kesekî baş nas bike divê mirov bi wî re gelek dem derbas kiribe. Min bi Evdila Keskin re sohbeteke kurt kiribû û ez wî baş nas nakim. Bi tenê profila wî ya medyaya civakî hindekî fikir dide min.

Ew entellektuel(intellectual)ekî dilnizm e. Ez bala xwe didimê, her kesekî bi bêhnfirehî guhdar dike. Bawer im ne mirovekî pêşedaraz e. Zimanê xwe ji kubariyê û ji zerafetê dûr naxe. Di vê dema hewldana kesan a êrîşa ser hevdû de, ev zerafet gelek girîng e bi ya min.

RABÎA ÇETÎN

Gava behsa Evdila Keskin dibe, seruvena dirêj û zehmet a weşangeriya Kurdî ya li vî

bajarê 16 milyonî tê bîra min. Wekî din jiyanaxweş û biqalîte ya bi Kurdî tê bîra min.

REHA RUHAVİOĞLU

Dema ez wî camerî ji dûr ve dibînim, bejn û bala wî wekî mîr û began bi min xuya dike, nêzîk dibim, dibînim ku bi rastî jî wisa ye. A duyem, ku deng û nefesa Şivan Perwer ji bo me çî be, keda Evdila Keskin û bêhna rûpelên kitêben Avestayê ji bo min ew e. Bo dengê Şivên ê ku Helepçeyê ji me re distirê û bi ax “hawar hawar hawar”, hawara xwe dilê me dikewîne, ez wî wek ewliyayekî dihesibînim û dibînim. Bo keda Avestayê ji Evdilla Keskin li ber çavê min wisa ye. Em çî bikin jî, nikarin layiqê vê kedê bin. Lê dîsa jî ya ji destê me tê jî em ji van kedan teksîr dikin.

WAHDET UÇAR

Bêşik, weke gelek kesan pêşî “Avesta” tê bîra min. Bawer dikim ew û Avestaya xwe di jiyana Kurdên xwende de bûne xwedî roleke girîng. Bi texmîna min di mala her kurdekî/e xwende de herî kêr pirtûkeke Avestayê heye. Me hîn rûbirû hev nas nekiriye lê texmîn dikim ku civata wî xweş e û ne qurre ye.



POPirs

Osman MEHMED,

Sala 1979an li gundê Qudbê yê bi ser Nisêbînê ji dayîk bû.

Di sala 2001ê de albumeke şî'ran bi navê "Bêdengiya Te" tomar kir.

Sala 2002yan kitêba wî ya pêşîn a bi navê "GulûCinûKavil" ji nav Weşanên Avestayê derket.

Ji sala 2012an û vir ve li Enqerê dijî. Karê wergêranê dike.

"Li Dor Kêvjalan" kitêba wî ya duwem e.



1-Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Payîz

2-Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Dengê Payîza min.

3-Tehemula te ji çi re tune ye?

Ji şellafiyê re.

4-Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Evdirrehman Qasimlo.

5- Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Ez jî wekî Mihemed Bilen li dinyayê bigerim.

6-Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî

zêde jê hez dikî bibêje?

“Derdî dûrî...

Derdî dûrî kuştimî”

Ciwan Haco / Hêmin Mukriyanî

7-Çi kenê te tîne?

Kesên ku cidî diaxivin.

8-Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Dengê Ehmedê Şamlû gava Mîrzayê Biçûk dixwîne.

9- Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Nivîsandina şî'ran.

10-Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Pûka berfê û bêhna axê ya piştî baranê.

11- Dîmeneke çawa te aciz dike?

Hemû dîmenên ku qerebalixî tê de hene.

12-Te dixwest tu li ku derê bijî?

Li Bunisraya berî salên 80yî.

13-Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Hêrsa min.

14-Tu dixwazî çawa bimrî?

Naxwazim bimrim.

15- Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Bawerr nakim ez ê bimrim lê heke mirim dixwazim ev risteya Mihemed Omer Osman bê nivîsandin: “Dixwazim ewqasî biçûk bi-bim ku dilopeke baranê bibe qebra min.”





PASAJ

Omer BEXTIYAR

sonmezomer21@gmail.com

“Şevêkê berî razanê Boncî ji nav cihê xwe rabû, balgiyê Lezgîn jê stand danî ser balgiyê xwe got, ez nema dikarim bi balgiyekî rakevim. Lezgîn di daîreya edebê de balgiyê xwe jê xwest, lê Boncî cihê ku balgiyê bidê bi simbêlê Lezgîn girt pê list, heya hinekî kaş kir çend têt bi destê wî ve hatin...Lezgîn bêyî hay ji xwe hebe bi dengêkî wisa bilind bi hêrs kire qîrîn û da çêran, dahfek li sînga Boncî da, Boncî li ser piştê xwe dirêjî erdê bû. Ji nav cihê xwe rabû, ber bi Boncî ve çû. Boncî tirsîyabû, serqûnkî xwe paş ve dikişand. Lezgîn dîsa hêrsa xwe lê anî, bala xwe daye ku Boncî li ber çavê wî hinekî piçûk bû. Şewqek li nav dilê wî, fikrek li nav serê Lezgîn ket. Bi qirika Boncî girt, bi dengêkî ji xwe bawer: “Tu qehpik kurê qehpan î tu pîj î, ne esil ne binyada te ne jî wefa li cem te heye segbav. Boncî mîna pifika ku hewa jê çûyî di destê Lezgîn de diçilmisî...”

Mihemed ŞARMAN

- Bermayiyên Demê
- Weşanên Avesta
- Rûpel: 45



FUAR E HA FUAR E!



NÊRÎN
Roza SÍERRA



Ji bo xatirê POPKURD'ê me berê xwe da fûara Amedê. Beriya ku herim fûarê min çavek li bernameyan xist. Hahoooo 6 roj! Bernameyên kurdî pir kêr bûn. Hema li her derê navê Şehmus Diken û Mıgirdiç Margosyan hebû. Tu dibê qey ev fûar tenê ji bo Şehmus Diken û Mıgirdiç Margosyan hatiye organîzekirin. Min got qey fûara Şehmus Diken e. Ecêb...

TÜYAP'ê navên bernameyên kurdî ji bi tirkî nivîsibûn. Pişt re bi xebata PEN'ê navên bernameyan bi kurdî ji hatine nivîsîn. Mala PEN'ê ava be. Jixwe li gorî prosedura pêvajoyan, Kurd ji her 10 salan carekê dibên "sal bi sal xwezî bi par. Sal û par, par bi par." Qeda li sal û par keve inşella.

Roja yekem a fûarê ez li hemû cihên fûarê geriyam. Xemgînî, kêfxweşî, fêlbazî, çeqeltî... maşella her tişt hebû. Çûm hemû standên fûarê. Min got ferq nake kurd, tirk, ereb, ermen, faris hemû xwişk û bira ne. Min dît ku hin nivîskarên tirk radipelikîn ser serê me û pesnên xwe ji pirtûkên xwe pirtir didan. Hema min rahişt çenteyê xwe û nema ber bi aliyên wan de çûm. Min tenê û

tenê berê xwe da standên kurdî. Wekî ji ber dilopê çûbim ber şirikê...

Hew min dît ku ez li zikê standa Wardozê me. Şikir piçek bêhna min derket. Piştî slavdayîn û girtina çend wêneyan, êdî me berê xwe da bazara pirtûkên kurdî. Li ser qedexebûna hin pirtûkan, acizî hebû lê dîsa ji bazara pirtûkên kurdî jî ne xirab bû. Hêdî hêdî bazar germ dibû, tansiyon geh radibû geh dadiket. Her nivîskarek li benda nêçîrên xwe bû. Pirtûkên ku nû derketibûn, li ser standan lotik davêtin. Lê hin xwîneran ji ber ku pirtûk nedikirîn, fedî dikirin slav bidana nivîskaran. Sibhanella... Tajî bi zorê naçe nêçîrê heyra.. Baş e ku bernameyên fûarê hene, meriv carinan xwe ji stendina pirtûkan û ji slavdayînên mecbûrî xilas dike. Ez jî bi dû mexdûrên fûarê ketim û em çûn qata jor, bernameya Kadri Yıldırım a bi navê "Kürt Medreseleri ve Alimleri". Piştî niv saetekê weku POPKURD kevirekî li serê min bixe û bêje Roza çi îşê te li vir e? Welhasil cardin ji derenceyan daketim xwarê, tişta ku di bîra min da mabû; Mele Mistefa kurê Xelîlê Sêrtî, mamosteyê Bedirxan Paşa ye.





Min berê xwe da cihê bêhnvedanê.

Ger armanca te magazîna kurdî be di rojên wisa de cihên herî xweş û dedîqodulî û trîplî ev der in. Dema ku tu dikeví hun-dir ewilî ferq dikî ku nivîskar û mirîd hene. Heqquet kesên baximsiz pir kê m bûn. Trîbên nivîskaran, trîbên weşanxaneyan tev li wir bûn. Min rahişt cixare û çaya xwe -helbet çay jî bêşekir bû. Ma kî diwêre li cihên wisa çaya bişekir vexwe. Eyb e, şerm e, qetlîam e. Çaya bêşekir jî bûye pîvana entelektueliyê- Piştî çaya bêşekir min dîsa berê xwe da salona fûarê, di ber çend weşanxaneyên kurdî re derbas bûm ku çend wêneyan bi-

grim lê wisa bayên polîtîk dihat ku makîne ricifî. Dema ku tu ji van weşanxaneyan pirtûkan nekirî, xwe wek xayinan hîs dikî, lensa makîne jî xwe wek ajanan hîs dike. Wellehî li cihên wisa çaya bêşekir jî te xilas nake... ji ber bayên sar cardin min berê xwe da qata jor.

Xelata pêşbirka helbestan a Arjen Arî hebû,

Emerîkê Sidiqayê ev xelat girt. Emerîk di axaftina xwe de got: "Evê xelatê heyata min guhert, ez ê her tim li pey Arjen Arî bim û layiqê wî bim." Her bijî Emerîkê Arjen.

Merasîma Xelata Wêjeyê ya Ehmedê Xanî jî hebû lê ez negihîştimê. Çimkî hişê min li ser înzekirina pirtûkan bû.

Li fûarê tiştê herî ecêb jî rojên înzeyan bû. Her nivîskarek wek serokeşîrekî tevdi-geriya. Roj roja eşîrtiyê bû, ne ya înzeyan bû. Cardin min fê m kir ku eşîrtî tunebe, îmze boş-belaş e. Bêguman nivîskarê herî populer ê fûara Amedê Mirad Bayram bû. Xwîneran jî înzeyan bêtir giringî didan storyên Mirad. Instagramê pêşîya eşîrtiyê digirt.



Welhasil bila zêde dirêj nebe. Nîşeyekê jî deynim û em derbasî beşa xwe ya nûçeyan bibin:

Li fûarê sêjenerasyon hebûn: jenerasyonên Facebook, Instagram û Twitterê. Tenê dixwazim li ser facebookê biaxivim. Nivîskarên ku emrê wan di ser 50'yî re ne, nîşê Facebookê ne. Hevalno ez ji niha de ji we re bêjîm; wekî brûskê xwe davêjin ber rehma Instagramê.

Me li ser navê POPKURD'ê ji çend berpirsyarên weşanxaneyên kurdî pirsî ka eleqe li gorî salên berê çawa bû û herî pir kîjan pirtûk firotine. Bersivên wan wisa ne:

Bahoz Baran (Wardož):

Li gorî fûarên berê tu dibêjî, em li fûarên berê tunebûn, em nû ne, îsal tecrubeya me ya ewil e. Li gorî ku ewil e jî gelekî baş bû, fûar ji çar salên berê xurttir e. Me dît ku folklor gelek bala însanan dikşîne, ji her deverên Kurdistanê insan tên. Hîn me îstatîstîkek dernexistiye lê gelek pirtûkên me qedîyan. Çapa pirtûka Deve Çima Xeyîdî jî belkî biqede.

Bawer Berşev (Pirtûka Kurdî):

Îsal tiştê ku ez dibînim gelek baş derbas dibe. Bi taybetî weşanxaneyên me yê mezîn ên wekî Avesta, Lîs, Nûbihar, Aram tijî dixuyin. Rewş baş e.

Pirtûkên ku herî zêde me firotin:

- Romana Recep Dildar, Leqat
- Romana Nûdem Hezex, Bîr
- Romana Jan Dost, Pîrewergêr

Davut Özalp (Peywend):

Li gorî ya TÜYAP'ê îsal baştir e, li gorî ya Şaredariyê çêkir hinekî din sist e. Wê çaxê em li navenda bajêr bûn, cihekî mezin dabûn me, atmosfera wê çaxê jî xweştir bû.

Pirtûkên ku herî zêde me firotin:

- Helîm Yûsiv Wehşê di Hundirê Min de
- Hesenê Metê Hefsar

- Du pirtûkên teoriyê
- Kemal Suleymanî Îslam Îslamîzm Dewlet û Netewperwerîya Kurdî
- Ronahî Onen Netewesazî û Ziman

Ronî War (Ava):

Îsal tevlîbûn kêm bû, rengê kurdî kêm bû.

Pirtûkên ku herî zêde me firotin:

- Şahmaran
- Hespê Qemer

Songül Keskin (Avesta):

Li gorî fûarên berê gelek cuda ye, ew xort û ciwan gelek kêm bûne. Pirtûkên nû ez naxime nav rêzê ji ber ku cara yekem e li fûarê derdikevin, baş tînin firotin.

Pirtûkên ku herî zêde me firotin:

- Bextiyar Elî Hinara Dawî ya Dinyayê
- Zerdüşt Avesta
- Pirtûkên Cegerxwîn
- Pirtûkên Hicri Îzğören



Ülkü Bingöl (Hîva):

Îsal baş bû, taybetiya Hîvayê ew e ku bi saya zarokan, malbat ji wêjeya zarokan a kurdî dişopînin. Ev tiştêki gelek balkêş e.

Pirtûkên ku herî zêde me firotin:

- Haydar Diljen Zimanê Me
- Çîrokên Berfin Ayşe Ögüt
- Seta pêşdibistanê Aynur Özbay
- Çîrokên Roza Metîna

Süleyman Çevik (Nubihar):

Bi qasî ku em dibînin xwendina kurdî kêr nebûye, digel ku rewş niha xirab e ji xwendin baş e. Li gorî salên berê, bi bawerîya min zêde neketiye. Lê divê xwendevanên kurd zêde bibin. Ji aliyê xwendinê de em wekî salên berê mane.

Pirtûkên ku herî zêde me firotin:

- Reso Şahê Dengbêjan
- Şakiro Kewê Ribat

Me herî dawî ji Abdullah Keskin jî pirsî lê wî pirsên me di qirika me de hiştin.

Abdullah Keskin rexne li POPKURD'ê kir:

Keskin: Çi îşê we bi firotin û tevlîbûnê heye, ew karê rojnemavaniyê ye, POPKURD wekî rojname û kovarên edebî tevdigere. Lê divê ew tenê li ser magazîna kurdî raweste.

Dengê dilê min: Helbet em dikarin li ser magazîna kurdî binivîsin û geş bikin, lê sansur û otosansur li bin guhê hev ketiye...



DENO

FENOMENEKÎ JI MALÊ,
LÎSTIKVANEKÎ ZÎREK



HEVPEYVÎN

Bilal KORKUT

bilalkorkt@gmail.com



DENO ;

**“DIYA MIN HERTIM
DIGOT, ZÊDE
LEQLEQÊ NEKE,
RABE Û BIKE.”**

Sala 1994an li Batmanê hatiye dinyayê, navbera wî û dibistanê tu car baş nebûye û xwendina xwe ya fermî bi kotekan aniye xeta serê lîseye. Piştî ji lîseyê jî tê qewirandin bi serserkî dikeve nava lepê jiyane. Îroj fenomenekî medyaya civakî ye û tenê li ser îstagramê nezî 500 hezar şopînerên wî hene. Ew û Bilal Korkut di lîstika Mîrzayê Biçûk de leqayî hev tîn. Deniz di Karaktera Mîrzayê Biçûk de ye, Korkut jî derhênerê lîstikê ye. Ji bo Popkurdê dîsa bi hev re ne û civateke xwe bi me re parve dikin.

Merhaba Deniz, Em bi Deno72 dest pê bikin. Tu karê Deno bi me bide naskirin?

Serçavan, Deno karakterek e ku ji civaka me derketiye. Dizek e, viran (derewan) dike, xirabiyên dike, eware ye. Heta tu bê bes, xirab e, pîçek e lo, lê mirov e...

Kesekî wan gotine te bibihîse ji Deno hez nake...

Na na gelekî şêrîn e. Hinekî jî weke me hemûyan e, eşkere yan jî veşartî. Ji ber vê yekê gelek kes jê hez dikin.

Tu çawa bûyî fenomen?

Min meyzand hemû kes femomen e, min got çima ez nebim ma çi ye min kême.

Fenomenbûn, li ser jiyana te ye rojane bandoreke çawa çêdike?

Deno û Deniz gelekî tevlihev dibin. Carna ez gazinan jî ji vê rewşê dikim lê Deno karên Deniz ên rojane gelekî hêsan dike. Şopînerên Deno li hemû deveran ji min re dibine alîkar. Dîsa jî ez dixwazim bibêjim: Li derve ez Deno nîn im ez Deniz im.

Bala min kişand ev demek e şopînerên te her roj kêmtir dibin, çima?

Ji ber ku min dest avêt karên bi qalîte û Henek li deverekê, ev pêlek e min navber da vînan. Şopînerên min ji vînen min hez dikirin. Lê mitalan neke. ez hînî formulê bûme, kengî bixwazim dikarim bikim milyonek, jî lê derd ne hejmar in.

Çiroka Şa Performansê çi ye?

Beriya werim Stenbolê ez li Batmanê bûm û di bin banê Tiyatro Tovê de dixebitîm. Min xwest ez eyarê xwe bigûherînim û min



berê xwe da Stenbolê. Piştî çend teşebusan me cihek kirê kir, li gel min Dilşah Ceylan û Tuncay Özel jî hebûn. Li Şa Performansê dikek, cafeyek û ofiseke me heye. Em hewl didin ku karên hunerî bi zimanê xwe bikin. Niha sê performansên me hene: “Ji Akademiyê Re Raporek” jî çirokeke Kafka hatiye amadekirin û Tuncay dilîze, Stendapa min heye bi navê “Ez û Deno” û helbet “Mîrzayê Biçûk”. Ez dixwazim vê yekê jî bibejim. Em ne bi tenê ne, gelek kes bi gelek awayan aliye me dikin lê yek jî wan kesan heye ku ez dixwazim navê wî li vir jî bi lêv bikim: Spas Fırat Kaya.

Te ji rojnameya Duvarê re gotibû Mîrzayê Biçûk xewneke min bû, ka behsa wê xewnê ji me re bike.

Tiştên xweş hemû jî bo min xewn in. Xwendina Mîrza jî xweş bû, min xwest ew xweşî bidome û ez jî ji hinekên din re bixwînim. Haya min ji adaptasyona ku Mamoste Çetoyê Zêdo kiribû hebû û min got divê em vê bilîzin. Piştî biryarê xewn bû xewnerêşk. Ji ber ku gelekî zehmet bû...

Ahaha xewnerêşk! haya min ji wan meseleyan nîn bû... (Dikene)

Na na, hinekî sebir bike hê min xilas nekiriye. Tu mafdar î mamoste, em li xewnê veşerî baştir e. Di encamê de afîşa me, jineke Emerîkî (Caillin Alainn) çêkir. Di koreografîyê de jineke Tirk (Nimet Şimşek) aliyê me kir, asîstana rejîya me yeke Acem

(Azadeh Abbasî) bû û ew kes hemû bi dilê xwe, bêpere ji bo kurdî xebitîn...

Kurmanc dîsa hatine jibîrkirin...

Tam min jî behsa van dikir te dîsa xeberdana min qut kir.

Kerem bike, min qut nekir, min bi şekir birî...

Dramaturg Umit Aktaş, muzîkjen Murat Demir, Ronahî Abdullah Tatal û Berkan Rodî, dekor û Kostum Bilge Kutlu. Li cihê me evqas nav jimartibana ve, me afîş parve kiribana ne baştir bû.

Nizanim, mesele hate vir, em çi bikin. Eger editoran jê hez nekir ji xwe qut bikin. Ew heval jî bi dilê xwe û bê pere xebitîn. Ez ji wan re spas dikim.

Ez jî dikim. Em veşerî xewnê. Tiştê derketî holê ji xewna min wir de ye. Dor li xewnên min ên dîn vekir.


Tu bixwazî em bahsa wan jî bikin yan jî Deniz dixwaze çi bike, xwe bigihîne ku?

Pereyan Min ji binê erdê dest pê kir. Roj bi roj ber bi dilê xelkê ve çûm. Niha dixwazim tiştên mayînde bikim. Mîrzayê Biçûk jî jî vê xwestekê derket. Ez bi vînan hatim naskirin lê naxwazim li wir bisekinim.

Ez jî dixwazim bibim fenomen, divê ez çi bikim?

Diya min hertim digot, zêde leqleqan neke, rabe û bike.





XÊZ

Bêrivan SARUHAN

saruhanberivan2@gmail.com

POP

NÛÇE



POP NÛÇE

Omer BEXTIYAR

sonmezomer21@gmail.com



Filmeke Kurdî ket nav listeya “Filmên ku divê bên kişifkirin”

Beşa Kulturê ya BBC'yê 12 filmên ku neketine listeya 100 filmên ewil, bi sernavê “Di sînemaya cîhanê de 12 filmên muhtêşem ku divê bên kişifkirin” ragihand. Di nav 12 filman de filma derhênerê bi nav û deng Bahman Qubadî ya “Dema Hespên Serxweş” jî heye.

Sêyemîn Festîvala Filman a Navdewletî ya Silêmaniyê bi rê ve çû

Festîvala ku di 10ê Cotmehê de bi filma “Keçên Rojê” (The Sun Girls) dest pê kir, di 16ê Cotmehê de bi merasîma xelatdayîne xilas bû. Filmên xelata çama zêrîn girtin ev in: Xelata Baştirîn Derhênerê bo filma dirêj: Mecîd Mecîdî, Xelata Baştirîn Filma Festîvalê: 3 Faces (Cefer Penahî).



Filma “Hewno Bêreng” a Kurdiya Zazakî dîsa xelat girt!

Di 55emîn Pêşbaziya Neteweyî ya Festîvala Filman a Antalyayê de derhênerê Kurd Mehmet Ali Konar bi filma xwe ya “Hewno Bêreng” xelata Derhênerê Herî Serkeftî girt. Herwiha derhênera Kurd Rojda Akbayir jî bi belgefilma xwe ya “Parçalar” jî SÎYADê xelat girt.

Filma Kurdi ya “Zagros” xelata “Oskar”a Belçikayê stend!

Filma derhêner Sehîm Omer Xelife ya bi navê “Zagros” di festîvala Ostend a Belçikayê de du xelat stendin: Xelata baştirîn film û ya baştirîn senaryo. Fîlma “Zagros”, yekemîn filma dirêj a derhênerê kurd Sehîm Omer Xelife ye û berhema hevbeş ya Kurdistan û Belçikayê ye.



Pirtûka “Destpêkek Ji Bo Felsefeyê” derket

Weşanxaneyê Peywendê pirtûka bi navê “Destpêkek Ji Bo Felsefeyê” weşand. Nivîskarê kitêbê akademîsyen İbrahim Borî ye.

Hejmara 34an a kovara “Kurt Tarihi” hat weşandin

Kovara Dîroka Kurdistan (Kürt Tarihi Dergisi) ku di her hejmara xwe de bi naverokeke têr û tije derdikeve pêşberî xwendevanên xwe, vê carê jî bi dosyaya “Tevgera 68an û Kurd” derket.



Albuma “Xewna Derew” a Diljen Ronî derket!

Diljen Ronî bi albumeke pop-rockê ya bi navê “Xewna Derew” derket pêşberî hezkir û guhdarên xwe. Ronî bo albûma xwe ya nû dibêje; “Ji bo muzîka Kurdi tiştêkî piçûk be jî, min xwest ez tiştêkî bikim.”

Yekem kovara muzîkê ya Kurdi “Ziryab” dest bi weşanê kir

Kovara Ziryabê bi editoriya Serhat Temel û Mewlûd Oğuz derket. Ziryab dê behsa jîyan, pîrsgirêk, xebat û projeyên muzîsyenên Kurd û muzîka Kurdi bike. Di hejmara yekem a kovarê de bi Kerem Gerdzenrî, Nîzametîn Arîç, Ayfer Duzdaş, Mem Ararat, Cem Şivan Ergul, Siya Şevê û Rewşen Çelîkerê re hevpeyvîn hatiye kirin.



EZ MÛSAYÊ DIKANDAR



GELEKÎ NAVDAR

Musayê DIKANDAR

atacmusa1@gmail.com



Merhaba xwinerên delal û hêja. Ez Mûsayê Dikandar û gelekî navdar. Ez vê nivisê bo we, ji dikana xwe- Bereket Gıda- ku piraniya we baş nas dike dinivisînim. Car caran ji hin hevalan dipirsim, dibêjim “hûn min çawa dinasin û bi çi awayî tîm hişê wê?” Dikarim bêjim hemû bersiv eynî ne:

“Em te bi dikana te, yanî bi Bereket Gıdayê dinasin.

Ez jî xwe bi vî şiklî didim nasandin, ji ber ku kefa'm gellek ji dikana min û dikandariyê re tê. Lewra rojê 15- 16 saetan, li dikana xwe derbas dikim û hema bêje hemû jiyana min li vir e. Dikana min, êdî bûye mala min.

Serê sibê radibim, solên xwe dixim lingên xwe û ber bi dikanê ve dimeşim. Ji ber ku li bajarên biçûk gelek mirov eynî karê dikin, di navbera wan da reqabetek heye, hemû dikandar dixwazin serê pêşî ew dikana xwe vêkin. Di ticaretê de qûrala sereke ye: divê tu beriya herkesî dikana xwe vekî û piştî herkesî bigrî. Heta niha min hêj nedîtîyê li Kozlixê beriya min dikana xwe vekirîye û piştî min dikana xwe girtiye! Ji ber vê carna hin kes ku behsa dikana min dikin dibêjin “dikana şev û rojê.”

Piştî ku min dikan vekir li benda mişteriyên disekinim. Her roj karê min ê ewil, qontrolkirina deftera deynan e. Ew kesên deynê xwe zû-zûka nadin û gelek diewiqînin, ez

navê wan di deftera deynan de bi rengê sor dinivîsim. Ev jî ji bo bavê min û du şirikên min peyamek e. Mesaj eşkere ye: Careke di deyn nedin van kesan!

Serê sibê hinekî karê min pir e, karê xwe yê rojane dikim, tiştan paqij dikim, kêmasiyan qontrol dikim, van rojan tiştan ku ez herî zêde dikim, guherandina fiyeta e. Ji ber rewşa krîza aborî her roj fiyeten tiştan diguherin, divê em jî vê qontrol bikin û fiyeta sererast bikin. Piştî ku min ev tişt kirin, ji xwe re li stranan guhdari dikim û li hal û ehwalê dinyayê difikirim. Nûçeyan dixwînim. Van rojan gelek li Sîmir Rûdan û Mirady guhdarî dikim.

Ev hemû li aliyekî, dikandarî karekî gelek zehmet e. Eger tu dikana xwe ji xwe re nekî mektebek, tu yê her tim westiyayî, jihevketî û bêkêf bî. Li eger tu cihê karê xwe bikî mektebek, tu yê jê gelek tiştan fêr bibi.

Tiştê min herî kêfxweş dike jî ew e ku piraniya mişteriyên min Kurd in û em bi hev re Kurdî dipeyivin. Dikarim bêjim kî çi karî dike bila bike, eger bi zimanê xwe bike û di warê zimên de gelek pirsgirêkan dikare safî bike. Gava ez pê li qûmandaya darebeyê dikim; ev risteya Odiseas Elitis tîm ber devê min:

“min jiyana xwe anî heta vê derê..”



ME JI 10 KESAN PIRSÎ:

Bi ya te li gorî her çar filmên (Sürü, Yol, Duvar, Umut) wî, mirov dikare ji bo sînemaya Yılmaz Güney bibêje sînemaya Kurdî?



EKREM YILDIZ

Te'rîfkirina filmekê yan jî formeke dîtbarî, girêdayî çendîn krîteran e û her krîter bi tena serê xwe têra te'rîfkirina qet'î ya filmekê nakin. Îro-roj li hindêk welatên wekî Brîtanya û Fransa yê, ji bo te'rîfkirina filmekê, krîterên wekî nasnameya derhênerî, rêjeya zimanê filmê, mekanê film û derîbeyaya filmê, huwîyeta lîstikvan û kirêkirina ekipmanan hwd. krîterên serekî ne. Li gorî van pêzanînên li jorê, heke em vegehin ser meseleya sînemaya Yılmaz Güney, bi qena'eta min divê mirov şikbir be ji cewabên xwe. Çimkî meseleya sînemaya Yılmaz Güney, belkî girifttirîn meseleya muşterek a sînemaya Kurdî-Tirkî ye. Belam heke mirov ji dîdeka kurdewar li her sê filmên Güney -Sürü, Yol û Duvar- binihêre dê 'sînematografiyeke kurdî' li ber çavê mirov hasil bibe. Lewma bi ya min divê em van her sê filman ji sînematografiya wî ya giştî veqetînin. Çimkî ev her sê film rasterast bi meselaya kurdî ve girêdayî ne. Her wiha



Güney, yekemîn kes e ku 'meseleya kurdî' aniye nav sînemayê. Vê pêngavê rê vekir li ber berbelavbûna 'meseleya kurdî' li seranserê cîhanê. Lê dîsa jî, xwe ji cewabeka qet'î didime paş; bo nimûne; eger filma Yolê wekî filmeka kurdî bê qebûlkirin û wek sînemaya kurdî bête binavkirin, ev yek tarîxnûsiya sînemaya kurdî diguherîne. Wê çaxê dê Yılmaz Güney bibe yekemîn derhêner, filma Yolê jî dê bibe yekemîn filma kurdî ku li Cannesê xelat biriyê.



BETÜL KEZAL ÇOBAN

Pênaseya sînemaya kurdî hîn bi gelek gengeşeyan dewam dike û di nava vê panoramayê da bicihkirina sînemaya Yılmaz Güney, di sînemaya kurdî da îdiayên dijber bi xwe re tîne. Ez vî karî dihêlim ser milê

sînemageran û wek temaşevanekê dixwazim behsa çar filmên wî bikim. Du filmên Yılmaz Güney (Umut, Duvar) digel ku hin nîşaneyên kurdbûnê dihundurînin, dîsa jî meriv nikare bibêje ku bi temamî behsa Kurdan dike. Çînên serdest û bîndest, mirovên perîşan, gundiyên belengaz, bajarîyên modern û feqîrên paşdemayî bêhtir li ber çavan xuya dikin. Herwiha di “Duvar”ê da, di sehneyên serhildana girtîgehê de dirûşmên balkêş jî hene ku li aliyekî dixwaze xwe eşkere bike. “Sürü”ya ku bi gotina wî “dîroka Kurdan” e, rastîhevhatina kurdan û dewletê ye. Mirov dibîne ku li hember çînên serdest û dewletê, eşîreke Kurdan (ji navan eşkere ye ku ew kurd in û car caran diyalogên kurdî jî hene) çawa belav dibe û têk diçe. Dîsa di “Yol”ê de rexneya edetên berê (bi rêya malbata Emîne û Zînê) heye.

Helbet ji gelek aliyan meriv dikare li van filman binêre lê ya ku ez dibînim, kurd di sînemaya wî da bi berxwedana xwe ya neteweperwer cih nagirin. Lehengên wî bêhtir mirovên têkçûyî ne ku di nava şerekî çînî de wînda dibin. Lê dîsa jî di nava şert û mercên dema xwe de serhildêrekî wêrek, derhênerekî afirîner, listikvanekî mezin, mirovekî dilsoz e û kurdbûna xwe jî înkâr nekiriye. Ev bi xwe jî, wî di cîhana sînemaya kurdî de wekî lehengekî nîşan dide.



SALIH SULEYMANÎ

Divê pêşîn sînorê sînemaya kurdî bi awayekî zanistî were diyarkirin ku em bizanin ka ji ku dest pê dike û li ku diqede. Li gorî têngiştina min a vê hunerê, ev çar film nakevin nav sînemaya kurdî. Ev yek tiştêkî têkilî ziman e. Bi ya min ferqa Yılmaz Güney ji derhênerên din ew e ku du dilên wî hebûn. Yek ji bo cîhanê yek jî ji bo Kurdistanê dixebitand. Ev çar film jî şaheserên wî ne û ji xeynî ziman, bi her tiştî kurdistanî ne. Ger em rastiya ku li Kurdistanê wek Kurd,

Ereb, Asûrî, Faris û Ermenan hebûna Tirk û Tirkmenan jî bidin ber çav, ziman jî Kurdistanî ye. Lewre em bi çî pîvanên sînematik (Nivîskar-Derhêner-Ziman-Mekan) hilgirin jî Yılmaz Güney û hunera wî kurdî nebin jî kurdistanî ne. Tiştêk din jî lê zede bikim; Kes nikare sînemayê li gorî zimanan kategorîze bike. Sînema li gorî tevgeran, li gorî heyaman û li gorî erdnîgariyan tê dabeşkirin. Mînak; sînemaya Ewropî, sînemaya Emerîkî, sînemaya Îranî, sînemaya Anatolî filan û bêvan.



KULÎLK ELÎKAKE

Xwedîbûn bi du awayan çêdibe; an tu, hewldanekê nakî tenê dest didî ser û dibêji: “ev ya min e.”(Ev xwedîbûna derew e.) An jî ew tişt bîngeha xwe bi şiklekî ji te hildigire û tu bixwazî nexwazî jî ew tişt “dibe ya te.” (Ev xwedîbûna rast e.) Li gorî min, ji bo ku miletek xwediyê tiştêkî bibe; hewce nake ku hemû nifşên çanda xwe, di wî tiştî de bibîne.

Yılmaz Güney filmên xwe bi hişekî çawa çêkiribe jî, neteweyî yan jî ne neteweyî, di filmên wî de Kurdek dikare bi hêsanî şopên xwe yên wekî; dîrok, hûner, ol, irf û edetan bibîne. Kurdbûna Yılmaz Güney di vê derê de girîng e, bes tenê ew sebeb têrê nake. Ji ber mijarên filmên wî, bi girêdayî rewşa kurdan a wan deman e jî.



MISTEFA YEŞİL

Li gorî Jimmy Choi; têgeha ‘Sînemaya Netewî’ jî bo filmên ku aîdî welatekî ne tê bikaranîn. Ji bo filmek aîdî welatekî an neteweyekê were hesibandin jî divê pîvanên wekî

“Welatê ku filmê fînanse dike, zimanê filmê, neteweyên karakteran, kincên wan, muzîk û hêmanên din ên çandî” li ber çavan bin.

Li gorî vê pênaseyê û van pîvanan gava em bi awayekî giştî li sînemaya Yilmaz Guney binêrin bê gûman em ê nikaribin bibêjin “Sînemaya Yilmaz Güney sînemaya Kurdî ye!”. Lê wekî ku we jî di pîrsa xwe de gotiye; filmên Güney ên wekî Kerî (Sürü), Rê (Yol), Dîwar (Duvar) û Hêvî (Umut) divê cihê werin nirxandin. Lewra ev film, him li heyameke taybet a jîyan û sînemaya Yilmaz Guney rast tên û him jî herî kêr yek-du pîvanên jorîn ên ku me hêjmartin, di xwe de dihewînin. Ew berhem, piştî zîndanîbûna Güney hatine çêkirin ku em dikarin bêjin sînemaya Güney di wê heyamê de vediguhere sînemayeke polîtîk û digihe karaktereke çepgir û netewî. Di vir de bi ya min mînaka herî giring di filma Rê (Yol) de xwe dide der. Lewra karakterê filmê çawa ku digihe derdora Ferêt, di şaşê de nivîsa ‘Kurdistan’ê derdikeve ku bi vê yekê Güney erdnîgarî, hişmendî û neteweyeke cuda destnîşan dike. Herwiha Yilmaz Güney bi xwe ji bo filma Kerî (sürü) jî dibêje: “Ya rast Kerî dîroka gelê Kurd e. Lê ne mimkûn bû ku ez vê filmê bi Kurdî bikşînim. Eger ku min lîstikvan bi Kurdî bidana axaftin, ew giş dê niha di girtîgehan de bûyana.”

Xwîner dikarin bêjin ku di gelek filmên din ên Tirkan de pîvanên li jorê hatî hêjmartin hene. Bo nimûne; di gelek filman

de navên karakteran, Bîlo, Eyşo, Zînê, Ebdo, Kejê û hwd. Nin. Fîlm li erdnîgariya Kurdan hatine kişandin û çand jî çanda Kurdan e. Lê çima ne ew lê ev filmên Guney dibin sînemaya Kurdî? Di vir de jî ez dikarim bi kurtasî bêjim ku divê pîvana me hebûn an tunebûna têgeha self-oryantalîzmê ya di van filman de be. Ku divê êdî em wek Kurd li ser self-oryantalîzm, sînemaya Tirkî û temsîla Kurdan û xwe rizgarkirina bînehişî ya ji vê rewşê jî bifikirin.



NESİM GÜREN

Ev niqaş wê hertim bê kirin û tu caran bersiveke teqez wê neyê dayîn. Her çiqas Yilmaz Guney kurd û Kurdewar be jî, ne tenê ji bo van 4 filman, sînemaya Güney bi giştî em nikarin wek sînemaya Kurdî bi nav bikin. Karakter û tîpên Kurd di filmên wî de hene, herwiha derbarê Kurdan de hin peyaman jî dide lê tevî van hemûyan sînemaya Güney ne sînemaya Kurd e. Jixwe îdiayeke wî ya wisa jî nîne.



LEYLA ARISOY

Na. Li gorî min, her çiqas Yilmaz Güney Kurd be û di filmên xwe de li bajarên Kurdan çêkiribe jî, filmên wî di nav sînemaya Kurdî de nayên hesabandin. Lewra hebûna miletekî, bêgûman bi ZIMAN e. Ji ber ku xema me di her beşên jîyanê de qebûlkirina ziman û nasnameya Kurdayetî ye, li gorî min Yilmaz Guney dijî kesayetiya wî, filmên wî, ne bi mijar û ne bi lehengan di sînemaya Kurdî de nayên hejmartin.. Li gorî min di çî beşên jîyanê de be jî divê Kurdek dîwarên xirabe yên mala xwe nehêle û nebe hostayê dîwarê miletekî din.





KEMAL SAVCI

Bê şik û bêguman bersiv “erê” ye. Ji ber ku lehengên xwe kitekit ji jiyana Kurdan hilbijartiye Erê zimanê xeberdana lehengan bi Kurdî nîne lê şexsiyet, tevger, sekin, xeml û jiyana wan bi kurdî ye. Di awirên Bêrîvan a filma Sürüyê da mehçûbiyet, bêçaretî, belengazî û binpêkirina rûmeta jina Kurd heye. Di bêdengî û bêzimanîya wê da jî bêdengîya jinê heye..Bala min kişandibû.. Berîvan di însaatê da mir.. təkiliya Kurdan û xebatkariya însaatan, feqîrî û xîzanî, bêkesî û rebenîya Kurdan û di nav van parametreyan da cîyê jina Kurd...

Bi eynî celebî, di filma Yolê da jî çiroka pênc lehengan bi çarçoveya Kurdî dertê hemberê me. Bi hikayeta Seyîd û Zînê, dîsa di jiyana rojane ya Kurdan de cihê jinê, belengazî û bindestîya jina Kurd li ber çavên me ye.

Filmên Yilmaz Guney, wê çaxê, di bin wan şert û mercên dijwar î zor de, bi tunebûnê hatine kişandin. Wê demê axaftina kurdî jî qedexe bû. Dîsa jî Yilmaz Guney bi nêrîna Kurdî rastiyên jiyana Kurmancan bi metaforên saxlem daye nişandan.

Ji ber van sedemên wisa meriv dikare bêje sînemaya Yilmaz Guney, “sînemaya kurdî” ye.



PELŞÎN PILING

Di filma “Dîwarê”(Duvar) ya Yilmaz Güney de mijar, serîrakirina zarokan di girtîgeha Enqereyê de ye. Li gorî hêman, mijar û cihê filmê, binavkirina wê ya wek “Sînemaya Kurdî” ne pêkan e. Lêbelê li

aliyê din filmên wekî “Kêrî” (Sürü), “Rê” (Yol) û “Hêvî” (Umut), bi rihetî mirov dikar wek Sînemaya Kurdî bi nav bike. Her çiqas zimanê van filman Kurdî nebe jî, bi hêsanî em têdigihêjin ku ew kesên Tirkîaxêv kurd in. (Sedema zimanê lê tê axaftin, bêguman zehf in lê ez li ser wan nasekinim.) Ji xeynî zimên gelek tişt hene ku xwemalîtiya nijadekî simbolîze dikin; wek dengê dengbêjekî yê di muzîka fonê de, têgeha eşîrê, axaftinên kurdî yên ji dûr ve tên, kurdîbûna zêmarên jinan, cilûbergên wan, axayê dujinî û hwd. Ji bo wan filmên ku bi hêmanên kurdî hatinê kişandin, binavkirina “Sînemaya Kurdî” divê xelet nebe.



KENAN ÖRMEÇ

Ya rastî ev pirs di nav me Kurdan de klîşeyeke mezin e û têgihîştina me ya sînemayê diyar dike. Ji ber ku Yilmaz Güney Kurd e, bêtir ku li sînemayê bifikirin, dibe ku ewilî me filmên wî jî di nav sînemaya Kurdan de bi cih kiribin. Lê êdî gava ku em bi têgihîştina xwe ya sînemayê ya niha li meseleyê dinêrin, ev klîşe hinekî din zelaltir dibe. Di edebiyatê de bêguman ziman her tiştî diyar dike. Zimanê berhemekê kîjan ziman be ew berhem di nav wê edebiyatê de tê bicihkirin. Ma em dikarin Yaşar Kemal û Selim Berekat di nav edebiyata kurdî de bi cih bikin. Hema bi Mishef em nikarin û nabe jî!

Îcar gava ku em berê xwe didin sînemayê, rewş tê guhertin. Zimanê sînemayê ji kamera, şewq, deng, montaj, reng, muzîk, dîmen, qunc, çîrok, mijar û hwd pêk tê. Yanî ez dibêjim çî? Yanî di sînemayê de em nikarin li tiştêkî tenê binêrin û bibêjin ku ew sînema ya filan qewmî ye! Ji ber vê sînema ne aîdî cihekî an jî qewmekî ye û welat û ziman ji bo sînemayê ne girîng in. Ma gelo çî təkiliya “Umut û Duvar”ê bi me Kurdan re heye? Haa ji bîr mekin, sînema dikare hemû dinyayê daqurtîne!

TÊ GOTIN...



GELO WE DIZANIBÛ?

Selamî ESEN

selamiesen@gmail.com

Di vê nivîsê de em ê derbarê stranbêjên Kurd ên ji Ekola Radyoya Bexdayê de çend agahiyan bidin. Hin agahî ji ber ku melûmatên devkî ne, tegezîya wan meseleya nîqaşê ye. Meseleya me jî ew e ku em hin agahiyên balkêş bidin û hin agahiyan jî dirist bikin ku heta niha xelet hatine zanîn.



* Ketina Zindanê ya Mihemed Arif Cizrawî

Tê gotin, Mihemed Arif Cizrawî (1912-1986) ji ber ku desteg dayê serhildana 1925'ê ya Şêx Seîd ketiye zindanê. Ev pêzanîneke îspatnekirî ye. Mihemed Arif ti carî behsa sedema ketina xwe ya zindanê nekiriye. Digel vê yekê, di wan çaxan de li Cizîrê diziyêke mezin diqewime, ji ber ku Mihemed Arif sêwî û biçûk e, radibin sûc dixin stûyê wî û wî têdixin zindana Dîyarbekirê. Ango bi serhildêran re, bi tesadufî dikeve heman zindanê. Di hevpeyvîneke xwe de jî wiha dibêje: “Hevalên min hemî şeniqandin, ez li ber hukmî neketim, ez berdîdam.” Jixwe Mihemed Arif hê 12-13 salî ye dema dikeve zindanê û 4 sal û 3 meh dimîne tê de (bnr. “Bilbilê Kurdistanê Mihemed Arif Cizrawî, Beşir Ant, Weşanên Ba, 2013).

* Kilama “Were Dotmam”

Kilama “Were Dotmam” wekî tê zanîn aîdî herêma Cizîrê ye. Gulsin keçeke gelek bedew û delal e. Ehmed Axa jî aşîqê dotmama xwe Gulsinê dibe. Gulsin jî, Ehmed Axa jî ji mala Şekir Axa ne. Ehmed Axa gelekî diqehire û diperite ji ber ku dotmama wî Gulsinê nadinê. Malbat mehra Gulsinê bi Muhsin re dibire. Meyrem Xan jî vê kilamê ji ber dizane û cara ewil ew di stûdyoyê de distre. Vêca Gulsin kî ye? Dîya helal a rehmetî Şerafettîn Elçî ye! Ango “dotmam”a di kilama “Were Dotmam”ê de diya rehmetî Şerafettîn Elçî ye.

* Kilama “Eyşana Elî”

Di kilama Mihemed Arif Cizrawî ya bi navê Eyşana Elî de Eyşana ku navê wê derbas dibe teqez ne Eyşe Şan e. Jixwe hêj ku Eyşe Şan derbasî Başûr nebûye, hê Mihemed Arif ew nas nekiriye ev kilam ‘icra bûye. Naxwe Eyşana Elî kî ye? Eyşana Elî ji gundê Heştanê yê Şirnexê ye, jina bimêr e û gelekî spehî û delal e. Feqe Xalid jî kurê serokê Eşîra Berwariyê (Seîd Axa) û birayê Egîdê Se’dûn e. Dilê wî dikeve Eyşana Elî û wê direvîne Duhokê. Li gorî gotinan; kilama Eyşana Elî jî ne Mihemed Arif Cizrawî lê Feqe Xalid bi xwe ‘icra kirîye.

* Mihemed Arif û Zekî Müren

Te dî, muzîk sînorên sosyolojîk binpê dike. Tê gotin ku şifêrê Zekî Müren rojekê li Stenbolê rastî yekî Cizîrî tê û jê re dibêje: “Zekî Müren çi dema ku li erebeyê siwar diba, ji min re digot kaseta Mihemed Arif deyne ser teybê. Digel ku Zekî Müren zimanê Kurdî nedizani, ewqasî aşîqê dengê Mihemed Arif Cizrawî bû.”





ESKICI CAFE

Ango Nostalji
û Aramiya
bi Dest û Pê bûyî



MEKAN

Yahya OMERÎ
yehyaomeri@msn.com
Wêne: Dawid Jikeviran

Li Wanê kê m mekan hene ku mirov bêhna xwe lê fireh bike, bi acizî û kêfxweşî lê rûnê. Ma qey mekanên em diçinê ne ji bo wê ye ku em li “rihetiya aciziya” xwe binêrin û carna bi meraq li maseyên li derdora xwe binêrin, hewl bidin çav bi keçeke ji baranê bedewtir an jî kurekî ji çiyayan cindîtir bikevin? Li dewsa we jî bêjim, carna belê! Mekanên em her diçinê ew mekan in ku em wan dişibînin xwe. Lew rabûn û rûniştina mekanaan jî heye, lixwekirin û birêveçûna wan jî. Cihên ku potansiyela tiştên ku em her di lêgerîna wan de xwe diwestinîn, di xwe de dihewinîn, mekanên me ne. Li ser meselê, kesên ku em wan qet nas nakin lê hobi û fikrên me nêzî hev in an jî hezki-



rinên me yên hevpar hene, li van mekanan in ku em bo du lib çayên cemidî tercîh dikin, rudinên û em dizanin dema em tî van mekanan kesên li derdorê ewqasî jî ne durî me ne. Ji ber wê, dema em tî van cihên wisa, aciz nabin, yanî dem û enerjîya em li van deran xerc dikin nayê çavê me, me nawestîne. Wiha difikirim ku di navbera me û wan kesên li maseyên li derdorê rûdinên de silaveke kurt û pirseke ku rê li ber axaftin û tecrubeyên nasyar vedikin hene.

“Eskici Cafe”, ango bi navê xwe yê bi dizî û ji tirsî kurdî, “Kevnefroş Cafe”, mekanek e ku çar pênc sal in ez car caran diçimê. Ev cafe li Wanê, di nav keç û xortên kurd ên bi taybetî sosyalîst û di demên axaftina meseleyên zor siyasî de jakoben û heta gelek caran xwe “küçük rewşenbîr” dihesibînin de, berbelav e. Lê li wê derê mirov rastî kesên ji gelek çîn û fikrên zehf zêde ji hev cihê jî tê. Cafe li jêra kolana hunerê (lê rehme bawer nekin ku ji bilî gelemşeya lezê û qirêja derengmayîne huner lê heye) li qatê duyem ê avahiyeke kevn e. Dema mirov bi pêlekanaan hildikişe, yekser hesta hatina cihekî anarşîst li mirov peyda dibe. Sedem jî ew e ku nivîs, karîkatur û posterên filmên ku ji gelek hêlan ve ji hev cihê ne û heta bêje li dijî hev in bi diwaran ve ne. Li cihê ku pêlekana bo bexçeyê cafeyê dizîvire, mirov çav bi dar û beran dikeve, heçku bexçeyê mala we ya li gund e. Xwediyê cafeyê, bexçe an jî eywana cafeyê, ser zikê wê betonê, bi gelek cureyên daran tijî kiriye. Her roj wan av dide, serê wan dişo û he’j ji şînbûna wan

dike. Gelek caran ciwan jî ji bo li teniştî siya van daran rûnin tî vir, çikû atmosfera baxçeyê cafeyê, bi awayekî wê ambiansa hişk a mekanên bi vî rengî ji holê radike, bêhn û beşereke henûntir lê dike.

Gelek kesên ku tî vir hest dikin ku li mala hevaleyê xwe an jî rasterast li mala bavê xwe ne. Ev bi asta zanîn û hişmendiya kesên ku tî vir re jî eleqedar e. Lew ew dizanin li afîşên filmên kemal sunal ên li çar terefên cafeyê dardakirî ne binêrin û fatîhayekê li ser ruhê wî bixwînin. Ev yek wan ji ser kursiyên biçûk û hişk radike, dibe salên temaşekirina wan filmên.

Wek min li jor jî got kesên tî van vî cafeyê bi pirranî xwende ne û nebe nebe bi şax-eke hunerê re mijûl dibin. Ev yek, xwe di rabûn û rûniştinên wan de jî dide der. Li ser meselê, hindê keçên zor ciwan û zor tenik, ji ber ku maruzî nihêrinên şet ên xortên şewitî nayên, vî cafeyê tercîh dikin. Rojekê yekê ji min re behs kir, keç bi wan sipehîtyên xwe yê ji rojên ewil ên bihuştê deynkirî, newêrin di hindê kolanên ku bi cafeyan û xortên argillikî ve mişt in derbas bibin. Di vî kêliyê de straneke ciwan haco lê dide:

**“Neçe bêriyê keçê tu ciwan î
Xortên gundê me hemî şivan in”**

Di vir de em tirsîyan dîsa. Me bi keçê re wiha biryar da ku keçik neçin bêriya wan cafeyan.

Tiştêkî din jî li cafeyê gelek kêl-mêlên kevn, entîke, rizyayî hene û ev dibe sedem ku em, yanî ciwanên li pey demên wenda,



li zaroktiya xwe bifikirin, pê xemgîn bibin û belkî ji ber vê hesta nostalgîyê kêfxweş bibin. Pê kêfxweş bibin ku ew goreyên rîs ên li wir dardakirî, me bibin wan şevên sar ên zivistana zaroktiya me. Dîsa ji ber ku internet û tişt miştên ku rê li ber sohbetên germ digre nîn in, keç û xort, heval û hogir bêhtir balê didin keserên hevdû, baştir li çav û rûyê gotinên hev dinêrin. Helbet hindê kes jî ji nebûna internetê aciz in, ez jî yek ji wan kesan bûm demekê. Hê gelek gelek berê bû, hîn kamil nebûbû sebra min, hedana min;

“Abê çawa internet nîn e ya?”

Di rojê sar û teng de, ruhê mişteriyên vê cafeyê bi stranên bijare yên kurdî, tirkî, farisî û gelek zimanên din ên cîhanê, perwerde dibe. Lê ji ber vê xwemaliya şûm a gelek xortên dûr ji van deran “îlkel”, heta çend stran û kilamên kurmanci nebihîzin kedî nabe sariya wan, li sohbetên derdorê germ nabin. Piştî çend libergerîn û stranên Koma Wetanê, kela dilê wan dadikeve û ew jî tevli germî û tengiya rûniştinên hevalên zor-zîrek dibin.

Bo me çar çay lê ji kerema xwe bila yek jê gelekî zelal be.

Zehf zelal!

Eskici Cafe, bi gotina xwediyê wê Mîko, ev mekan dojeh û bihuşta kesên bextewar û aciz ên biqalîte ne. Stargeha antîleheng û têkçûyîyan jî ev mekanê ku pêşengê wê Mîko ye. Bejna wî şeş metre, kêfxweşî û gelemşeya wî heyşt metre ye. Em ên av û av têkçuyî tên gelek caran li vir bi nebûna

sohbetên kurdî û nînbûna sûretên helbesta kurdî aciz dibin. Rind tê bîra min rojekê hevalekî xwest rabe ser maseyê û ji bo sedqa serê xwe ji tûrikê Fêrik û Cegerxwîn helbestan belav bike û dilê xwe li kurmanciyê rehet bike. Bi vê yekê re belkî bibûya leheng lê baş e ku car caran hevalên hêja yanî yên mamoste, helbestên kurdî li vir dixwînin û kêfa her kesên ku bi nan û avê kurdî mezin bûye tinin, êvar û sohbetên li vir xweş û geş dikin.

Sehet xaş mamoste.

Lê helbet di şevên wiha de kurdî, dengê herî lawaz lê yê herî nasyar e. Di nav wan birrek dengên ji heman rengî û heman hêrsa dewletê ne de.

Ne şaş bim pênc sal berê bû dema me ev cafe nas kir û bi hevalê xwe yê ji helbestê naziktir û ji hênikaya berêvaran şêrîntir Şahîn re çûn. Paşê me xwest wê demê dîwarê li hember derî yê cafeyê ku beşeke mezin ji bo risteyên xweş, silogan û aforîzmayên xweş hatibû terxankirin biguherînin û çend dengên kurdî lê zêde bikin. Ji xeynî kurdî jî tiştên li wir hatibûn nivîsîn têra xwe erebesk û beradayî bûn li gorî me, bi taybetî jî li gorî Şahîn. Loma me xwest em li gorî xwe wan derên bi makyaj û gotinên bi taybetî zêde nexweş, tehmsarkî xweşik bikin, ango bi riya kurdî û çend tiştên din wê kamil û tekmlî bikin. Bi wê mebestê me qaxiz û qelemê xwe derxist û li cihê herî stratejîk ê vî dîwarê kêf û girî runiştin. Me dest pê kir ji helbestên herî xweş ên kurdî û tirkî û helbestkarên biyanî yên li van zimanan hatiye wergerandin, riste û hevokên zor ciwan nivîsand û bi dîwêr ve kir. Hema bêje sê saetan em li ser vê armanca pîroz a tenikkirina ruhê keç û xortên Eskici Cafeyê xebitîn, axir bi saya vê ked û çaya sedûheyştê deqeyan, pardon xulekan, me sûretê dîwêr gelekî guherand. We ew dîmen û ew xebata ha bidîta hûn ê ji kêfa bigiriyana. Wê şevê xewa Şahîn xweş bû, şeş xewnên tijî gul û helbest dîtibûn. Lê qey xwediyê cafeyê ji wê têkoşîna me aciz bûbû, lewre piştî wê bi du sê rojan dîwarê katarsîsê ruxand. Ya rast





em zêde li ber neketin. Qe nebe em ji wan kolajên erebesk û navên heval û xoşewîstan xilas bibûn.

Cafe, hema bêje ji ortê bi sînorekî ji du textên ku yek li jor û yek jî bi qasî sê bihostan ji zemînê bilindtir, bi her du diwarên pêş û paş ên kafeyê ve hatiye daliqandin dibe du beş. Li her du hêlên vî sînori çend maseyên biçûk, TV'yeke mezin û yeke biçûk, aparloreke mezin, telefoneke malê ya sor û kevn hene. Bi textê jor ve jî sêveke mêxekrêj, pêlîstokeke pîrhebok ku melkesa wê ya pê difire jî di nav her du çîmên wê de ye, teşîyek, firfirokek (topaç) û çend aksesuarên din dardakirî ne. Ez dibêm qey gelekê wan ji odayên zaroktiya min hatine derxistin, yan jî ji odayên van hevalên ku di bin ronahiyên derdorê dîyê cixarê pifî ser rûyê hevalê xwe dikin. Axir ev hemû tişt nas in û ji loma bi dîtina wan re têkiliyeke jixweber û qewîn di navbera me û eskici cafe û hevalên nenas ên êvaran tîn vir de çêdibe. Dibêm qey ev dibe sedem ku gelek caran em çavên hev nas bikin.

Li dîwaran, gîtar, tembûr, teyîb, bêjing, saet, tûrikek û tûrikekî din, Bob Marley, Cem Karaca û li orta kafeyê sobeyeke sergînan hene. Ev hemû tiştên min ew rêz kirin ambians û ruhê mekanê germtir dikin. Ez li vir hest dikim ku gaveke din wê zaroktiya min a di şevên kêr ronahî û tije çîrok de asê maye ji derî têkeve hundir û min bibe lîstik û westa wan rojên dirêj û biçêj. Lê ji nişkan vê çay tê ber min û li rû û livên hevalên her

tiştî gelek caran nezaketên dikin diqelibim. Çaya xwe bi germî vedixwim.

Carna bo dîtina û bihîstina hevalên meylên cuda yên hunerî bi wan re hene, diçim wê kafeyê. Di van deman de bi piranî tenê diçim û guhê xwe mit, çavê xwe zîq dikim û li benda tiştêkî dimînim. Guh didim nîqaşan. Li tevgerên mişteriyên dinêrim. Di wan deman de peyv û dîmenên ku zêft dikim, dibin sedem ku li tiştinên din jî bifikirim, li hizra kursiyan mesela... Mesela xema kevokên ku car caran li wan deran digerin û Mîkoyê xwediyê kafeyê ku bi kurmancî gazî wan dike û ji wan re li nay û ney û bilûrê dixê, westa baskên wan digre, difikirim. Ev zêde dirêj dom nake, lewre kursî biçûk û hişk in, qûna mirov li ser diêşe. Loma kursiyên vê kafeyê jî ji mişteriyên re dibêje zede rûnenê yabo! Te çaya xwe vexwar, hinekî çavdêrî kir rabe bi kolanan ke ve. Kursî rast dibêje dibê, radibim bi kolanan dikevîm.



ORHAN TANHAN



HEVPEYVÎN

Kenan ORMEK

ormekenan@gmail.com

Orhan Tanhan

Di sala 1977an de li gundê Cibil-girawê yê Nisêbînê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî û navîn li Nisêbînê û lîse li Edenê qedandiye. Ji beşa Mamostetiya Polê ya Zanîngeha Çukurovayê mezûn bûye. Di sala 2006an de li Dêrsimê dest bi mamostetiyê kiriye, piştî li Wan, Mêrdîn û Sînopê mamostetî kiriye û niha jî hê li Tatwanê mamostetiyê dike. Heta niha tevlî gelek pêşengehan bûye û bi dehan xelat girtine.

Ev çend sal in te dest bi wênekêşiyê kiriyê?

Herçiqas bibe heşt sal ku min dest bi wênekêşiyê kiribe jî, ji roja ku min ji gundê xwe bar kiriyê û heta niha çi tiştên ku min derbarê gundê xwe de xeyal kiriyê ji bo min wêneyek e. Hê jî li pey wê hêviyê me.

Bandora kê li te bûye heta niha, tu dikarî behsa vê bandorê bikî?

Bandora hunermendê wênekêşan yên wek Mehmet Arif Yavuz (ku mixabin di wextekî zû de ji nav me koç kir), A. Fatih Sönmez û Musa Talaşlı li min bûye. Bandora wan jî bi vî awayî bûye: Min dil hebû ku wêneyên xwezayê bigirim lê bi wan re min berê xwe da “mirov û jiyane”. Tengezariya jiyane û qermîçokên rûyekî hê bêtir bi hêz bûn. Bandoreke wisa li min bû.

Wexta ku mirov li wêneyên te dinêre dibîne ku hemû dîmenên te li derveyî bajêr in. Gelo tiştên ku te ji bajêr dûr dixin çi ne?

Mirov tu carî hisreta pêşerojê nake, herdem bi hisreta paşerojê dijî. Ez jî her dem bi hisreta jiyana ku jê hatime qewirandin dijîm. Ji ber vê jî wêneyên gundewarî û çolteriyê digirim. Ya rastî bi van wêneyan, jiyana xwe ya ku nejiyame dideribînim. Li bajaran min wêne negirtine ji ber ku ji qilîma, antên, boriyên naylonî, xaniyên betonî û hwd. nefret dikim.

Îro roj weke hemû beşên hunere pir kes berê xwe didin wênekêşiyê ye jî. Gelo ev pêvajoyê dê bandoreke çawa li we bike?

Ya rastî bandora telefonên pahn pir e. Kilişeyekê her serdemê heye. Aniha wênekêşî kilişeyek e. Ji hinekan heye ku xwedî mekîne û objektifeke mezin bin dê bibin wênekêşekî/e mezin. Bi wext re an dê ev hewesa wan mezin bibe an jî dê bi avê de biçê. Ji sedî pênc kes jî dê berdewam nekin. Bi awayekî erênî-neyênî dê bandora me li hev bibe lê dê tesîreke baş li wêne û civakê

bibe. Ji ber ku wêne belge ye û her belge dîrok e.

Mirovek çawa dikare bibe wênekêşek?

Bêguman her kes dikare wêneyan bigire lê her kes nikare bibe wênekêş.

Gava ku tu wêneyekî digirî tu çawa biryarê didî?

Divê carina di nav saniseyekê de tu biryarê bidî, carina jî di mehekê de. Ya ewilî şens e, ya din jî bi hêza xeyalê ve girêdayîye.

Tu bawer dikî ku te wêneyê herî baş girtiye?

Na! Wêneyê herî baş ew e ku hê nehatiye girtin.

Jiyan bi hemû aliyên xwe di wêneyekî de bi cih dibe gelo?

Li gorî min jiyana bi hemû awayî di wêneyekî de hilnayê ji ber ku wêneyek tenê tiştêkî ji me re dibêje. Wê keliyê tu çi hîs bikî ew e. Ya rastî her wêneyek keliyêke mirî ya jiyane ye. Yanî di çarçovê de çi hebe qediyaye. Careke din dê dubare nebe. Wêne, dîmenek ji wextê mirî ye.

Heta niha te gelek xelat stendine, xelat çi bandorê li te dikan?

Xelat mirov motive dika û her çiqas kêmbê jî ji bo wêneyan bigirim alîkariyêke aborî ye.

Ji bo siberojê çi projeyên te hene?

Çend projeyên min hene lê ez aniha nizanîm dê kengî biqedin. Ji ber ku çi gava ku ez dibêjim qediyane bi kêmasiyêke din re rû bi rû dimînim.

TÜRİK

Çirok Pêkenok Mamik Biwêj Gotinên Pêşyan Klam Bêlînte Qesîde Mêvanxane



WWW.

rozasierra
.blogspot.com



rozasierra